**P’îr Ĥemîdê Bek’irê Ûsib**

# JI XEZINA ULMÊ ŞÎXADÎ

**T’ILBÎS**
**1998**

# ЕЗИДСКИЕ МОЛИТВЫ

*по рукописям духовного лица*
*пира Хамиде Бакре Мабуби*
*(1912-1987)*

## RÎZMA NIVÎSÊ


1. Şeda sibe zû ……………………………………………15
2. T'erqîn…………………………………………………16
3. Di'a…………………………………………………….18
4. Beyit'a p'ira ………………………………………….. 21
5. Di'a ya Hîvê …………………………………………..22
6. T'esmîlî li e'rdê-l………………………………………23
7. Di'a t'esmîlî e'rdê-2 …………………………………….23
8. Qewlê Êzîd…………………………………………….24
9. Qewlê Cim'a Cimlete…………………………………28
10. Qewlê Qereferxanî……………………………………..32
11. Qewlê Ferxedin………………………………………..35
12. Qewlê Zebûn ………………………………………….44
13. Qewlê e'rd u e'zman…………………………………..48
14. Beyit'a heyi male……………………………………….49
15. Qewlê Boreborê………………………………………….53
16. Beyit'a şex Mende Ferxa………………………………57
17. Beyit'a şex Ale Şemsa…………………………………61

## 1. Se’da sibê zû[1]

*1 Şehda[2] miqîm[3] Ellah[4],*
*2 Şîxadî – ĥebîb[5] Ellah,*
*3 Şêxsin[6] – r̂esûl Ellah,*
*4 Merge, Meqlûb sela,*
*5 Silava me Mergê,*
*6 Cemayê[7] binîmayê,*
*7 Lalişe xwedanê[8] qubê[9],*
*8 Ciyê êzdîxane lê dikine sicûdê.*
*9 Heqê min – Şîxadî,*
*10 Baqiyê min – Melîşîxisin[10],*
*11 Dînê min – Şerfedîn,*
*12 Mesebê min – melî Fexiredîn,*
*13 Ĥeca min – Qubildar[11],*
*14 Îtqeta min – Êzîdê sor,*
*15 Ciyê sinîxan lê dibine mor.*
*16 Sinîme[12], sinîme,*
*17 Şêx, p’îr, hosta, merebîme,*
*18 Ser̂t[13] evdê kaniya Sipîme,*
*19 Mirîdê şêxê Adîme[14],*
*20 Her ĥemd Ellah[15] şikir[16] ezî êzdîme.*
*21 P’îrê min – hostayê min,*
*22 Şêxê min – mewlayê min,*
*23 Derdê min – dua’yê[17] min,*
*24 Şehdetiye xwe nave Tawisî melek’ daye.*

---

[1] (15-16)
[2] *şe’da*
[3] *mik’ûm*
[4] *Elah*
[5] *ĥebûb*
[6] binêr *melik Şêxsin*
[7] *cimayê*
[8] *xudan*
[9] *Qube*
[10] *Melîşîxisin*
[11] *Qubildar*
[12] *sunîme*
[13] *ser*
[14] *şêx E’dî*
[15] *Herĥemdila*
[16] *Şikir*
[17] *dia'*

## 2. T’erqîn[18]

*1 Selam Elê[19],*
*2 Nazil Elê[20],*
*3 Ela qebûl,*
*4 Minet cinet,*
*5 Cinet ji nûr,*
*6 Eleyî Te’ala[21],*
*7 Te’ala r̂esûl,*
*8 Qebûl dua’[22],*
*9 Fetĥa[23] int’în[24],*
*10 Qewlî int’în,*
*11 Qismî xetm[25],*
*12 Make – makînde,*
*13 Qulib mace Nûne[26],*
*14 Delîl mirace Nûne[27],*
*15 Îlahî e’lêkûm[28] t’ece Nûne[29],*
*16 T’erqîneke dixûnim,*
*17 Dengê xwe hiltînim,*
*18 Nav–dik’irê Şîxadî, melî Şîxisin tînim.*
*19 T’erqîne ji Ya Sînê[30],*
*20 Dem–deme xafe Nûne[31],*
*21 Şehde[32] her qanûne[33],*
*22 Xerqê Şîxadî K’afe, Nûne[34],*
*23 Ewlayî, mewlayî,*
*24 Feqîrê simlayî,*
*25 Wellah[35], Billah[36][û Tillah],*
*26 Miletê Adem r̂êşûl Ellah,*
*27 Ev eda[37] emane[38],*

---

[18] (16-18)
[19] *sela melê*
[20] *elêê*
[21] *tie’ala*
[22] *di’e’a*
[23] *fet’iĥa*
[24] *e’nt’im*
[25] *xitim*
[26] *macenûne*
[27] *miracenûne*
[28] *e’lêkim*
[29] *t’ecenûne*
[30] *asîn*
[31] *xafenûne*
[32] *şe’de*
[33] *nerqenûne*
[34] *k’afenûne*
[35] *Welila*
[36] *webila*
[37] *ede*
[38] *emen*

*28 Emane qisma zêdeye,*
*29 K'ulindayî, k'ulind xeta,*
*30 Xeta ji xêb,*
*31 Xerac xezeb,*
*32 Afû  r̂e'met,*
*33 Şêx û p'îr,*
*34 Hosta, merebî,*
*35 Yar birê axretê,*
*36 Bin dara zincilt'ê,*
*37 Hev digrin t'erîqetê.*
*38 Xitimî tihabê,*
*39 Sinet min ceme[39],*
*40 Şile't mixerin,*
*41 Kaniya Sipî qulbe be,*
*42 Ĥeĉê kesê ser dîn k'ete,*
*43 P'ar lê[40] nede. Amîn, amîn.*

*Fet'ĥa t'emametî Şîxadî!*
*R̂ehme[41] li dê û bavê hostayî!*

## 3. Dua'[42]

**S. 1**
*1 Her ĥemd Ellah[43], her ĥemd Ellah,*
*2 Seyîdîne – nebîne,*
*3 Şivate zedenîne,*
*4 T'ebîbî qulebîne,*
*5 Îlahî mewlîne,*
*6 Ferz il[44] e'lemîne.*

**S. 2**
*1 Dua'kî[45] dixwezim e'nzelî r̂a[46],*
*2 E'nzelî menzelî r̂a,*
*3 Xwedanê[47] Miĥemed E'lî r̂a,*
*4 Fetĥa qedel bevşî mom r̂a,*
*5 Qewlî K'emala r̂a,*
*6 Bizirgayê Xweda r̂a,*
*7 E'ynat[48] – beyînet'ê K'erîm[49] Ela r̂a,*

---

[39] *minceme*
[40] *tê*
[41] *r̂eme*
[42] (18-21)
[43] *herĥemdile*
[44] *ferzil*
[45] *di'akî*
[46] *ra*
[47] *xudan*
[48] *e'yînet'*
[49] *k'erîm*

*8 Ji zê r̂a, zîyaret r̂a,*
*9 Demîra e'zet r̂a,*
*10 Not ĥezar eshabê[50] heqîqet r̂a,*
*11 Semara sefa r̂a,*
*12 Sefa e'zîz r̂a,*
*13 Ji Xidir nebî[51] Xidir Eyîlas r̂a*
*14 Danzdeh ĥezar nebîyê xas r̂a,*
*15 Danzdeh ĥezar weliyê xas r̂a,*
*16 Ji Aqûb p'êẍember[52] r̂a,*
*17 Ji Ûsibê nebiya r̂a,*
*18 Dawid[53] p'êẍember r̂a,*
*19 Neh kur̂ê[54] Aqûb p'êẍember r̂a,*
*20 Seyîd Miĥemedê k'ibîr [r̂a],*
*21 Wesil[55] Quranî r̂a[56],*
*22 Şêx E'bd il-Qadir Gêlanî[57] r̂a,*
*23 Avokê Senemî r̂a,*
*24 Çil çar p'îr̂ê Demirqat r̂a,*
*25 Ûnis p'êẍember r̂a,*
*26 Cercîz p'êẍember r̂a,*
*27 Seyîd p'êẍember r̂a,*
*28 Haziyanî R̂om r̂a,*
*29 Xaziyanî R̂om r̂a,*
*30 P'adşayê mek'em Medînê r̂a,*
*31 Mifriq da Mişriq,*
*32 Mişriq da Mifriq,*
*33 Eva dua'–diroza nûr û nedera Şemsê eynî [minî] T'evrêzî r̂a.*

**S. 3**
*1 We siqana[58] we t'iya'na[59],*
*2 We kesanê e'lîme dan[a][60],*
*3 Delaletî fesilê minî Adem,*
*4 K'ulî–k'ulî xaliq[61] Ellah,*
*5 Ya melek ehsab,*
*6 Sihab li tem,*
*7 Melih sebirî,*
*8 Melih sit'irî,*
*9 Melih gorî,*
*10 Melih sûret r̂eme[62],*
*11 Qurbana nebî Îsmayîl qebûl.*
*12 Qebûl qurban,*

---

[50] *e'sab*
[51] *Xidirnebî*
[52] *P'êẍember*
[53] *Davît*
[54] *kur*
[55] *weyîsil*
[56] *Qiran*
[57] şê *E'vdil Qali Gêlanî*
[58] *wesiqana*
[59] *wet'iya'na*
[60] *wekesanê e'lîmedan[a]*
[61] *xalq*
[62] *sûretreme*

*13 Meẍbûbî[63] Ellah[64],*
*14 Sifrayî[65] Celîl[66],*
*15 Berek’et Îbrahîm Xelîl.*
*16 Xem nebe, dem nebe,*
*17 Mal–r̂isqê te zêdabe,*
*18 Eva nan û êmeka,*
*19 Xêra miriya qebûlbe.*

## 4. Beyt’a p’îra[67]

**S. 1**
*1 P’îro, qedrê te geleke,*
*2 Dergewan derê cinetê weke[68],*
*3 P’îr Ĥecî Miĥemed bûye[69] p’îrê şêx Îsn Ĥesnanekî.*

**S. 2**
*1 P’îro, qedrê te girane,*
*2 P’îr bûye camiya ĥemû mêrane.*

**S. 3**
*3 P’îro, p’îrê bav [û] pisa (e),*
*4 P’îr, t’û kesî netirse,*
*5 R̂ê û me’niya bavê xwe di pirse[70].*

**S. 4**
*1 P’îr ji atqatê[71],*
*2 P’îr bûye p’îrê şefa’etê[72],*
*3 Çi p’îrekî k’afil demane,*
*4 P’îr bûye p’îrê axirzemane.*

**S. 5**
*1 P’îr ji bedîl,*
*2 Berî qalê, berî qîlê,*
*3 Not ĥezar sal min tu dîtbû qendîlê[73].*

*R̂ehme li dê–bavê hostayî!*

---

[63] *mexbûr*
[64] *elah*
[65] *surp’e*
[66] *celîl*
[67] (21-22)
[68] *veke*
[69] *biye*
[70] *dipirse*
[71] *at’qat*
[72] *şivae’t*
[73] *Qendîl*

## 5. Dua' ya hîvê[74]

*Amîn, amîn!*
*T'ifalêke eledîne.*
*Şêxê Ĥesenî xaldîn,*
*Hîveke Xudeye,*
*Duȓeke qîmetiye,*
*Hîve.*
*Nuĥ – qizmêtî Nuĥ.*

## 6. T'esmîlî li e'rdê - 1[75]

*1 Eşed heq, meşed heq,*
*2 Nar heq, nûr heq,*
*3 Xwedê heq, heqil heq,*
*4 E'rdê Dewrêş Adem,*
*5 Êzdiyo, tu bexê silt'an Êzîdî,*
*6 Xwedê sitariye dua' ȓuĥê[76] te bike.*

## 7. Dua' t'esmîlî li e'rdê - 2[77]

*1 T'eslîmî t'eslîmatê,*
*2 T'eslîmî Dewrêşê e'rd,*
*3 Ya Dewrêş e'rd,*
*4 Bixefirînî, bisit'irînî,*
*5 Sihabê ȓuhê wî bikî,*
*6 Berxa Êzîda[78],*
*8 Toqa Tawis melek'[79] istiyê wî da ne,*
*8 Toqa silt'an Êzîd istiyê wî da ne.*

## 8. Qewlê Êzîd[80]

**S. 1**
*1 Êzîd didim[81] medehe[82],*
*2 Lalişe xwedanê[83] qubê,*
*3 Xelat kirim sitêra sibê.*

---

[74] (22)
[75] (23)
[76] *riĥ*
[77] (23)
[78] *Êzdîd*
[79] *Melek*
[80] [31] (24-27)
[81] *dudo*
[82] *medeye*
[83] *xudan*

**S. 2**
1 *Xelat kirim sitêra sibê,*
2 *Sê ĥerfa qebûl kirim,*
3 *Ez hatime r̂abe,*
4 *R̂abirim, birime pêşe,*
5 *Von ĥerfa*[84] *dikim t'evt'êşê*[85].

**S. 3**
1 *Ji hev kirin Ĥeşem*[86], *Qurêşe*[87],
2 *Ĥeşem, Qurêşe ji hev kirin,*
3 *Sê ĥerfa qebûl kirin,*
4 *Qal, qîl di hev kirin,*
5 *Xalqê feqîr mixfî*[88] *kirin,*
6 *Feqîre mixfîne r̂êya*[89] *xwe r̂azîne,*
7 *Destê silt'an Êzîdda we'danîne.*

**S. 4**
1 *K'ivş bûne nasebirin,*
2 *Dahir*[90] *bûne nae'şirin,*
3 *Silt'an Êzîd xwedanê xofa kêm dikirin.*

**S. 5**
1 *Xwedanê xofa ta'liya*[91],
2 *Hûn werin vergirin siliya,*
3 *Dest bigrin*[92] *dîwanê E'devîya*[93],
4 *Ji wê bibînin şayan, xoşiya,*

**S. 6**
1 *Şayan, xoşiya li wê bibînin,*
2 *Mal wan wara namînin,*
3 *Serê xwe r̂êya*[94] *silt'an Êzîd nehêwşînin.*

**S. 7**
1 *Mal naminin li wan wara,*
2 *Xwedanê ketnan k'ala,*
3 *……………………………(?)*

**S. 8**
1 *Feqîr heye denge,*
2 *Deng dike ĥezar r̂enge,*
3 *Ĥemûye mor ser zenge.*

---

[84] *vê ĥerfê*
[85] binêr *t'eftîş*
[86] *ĥeşem*
[87] *kurêş*
[88] *mifqî*
[89] *r̂iya*
[90] *deher*
[91] *teliya*
[92] *bikin*
[93] *e'dewiya*
[94] *r̂iya*

**S. 9**
*1 Ser xenge ĥemûya more,*
*2 Cahilê nefsa[95] wî xare, ne li jore,*
*3 Ĥizreta wî silt'an Êzîdê sore.*

**S. 10**
*1 E'limayî bin wêlo,*
*2 Qasidê êlimiya[y]î sêlo,*
*3 Sêlim qasidê êlimiya.*

**S. 11**
*1 Girîvanê[96] lê şîdiya,*
*2 Silt'an Êzîd mişûre ĥemû ciya.*

**S. 12**
*1 Silt'an Êzîd ĥemû ciya mişûre,*
*2 Nêzîke, ne [yî] dûre,*
*3 Xewasê[97] behrê[98] k'ûr̂e.*

**S. 13**
*1 Wan qesira, wan sûka,*
*2 Wan mifta, wan sindirûka[99],*
*3 Em ĥeyrî[100] cotê bûka.*

**S. 14**
*1 Cotê bûka zor qumaşin,*
*2 Ewe cindî hûra basin,*
*3 R̂ojê sê cora diçine dîwana Şîxadî, wanar̂a tên dewra maşin.*

**S. 15**
*1 E'rifê[101] Beẍdayê,*
*2 Hûn werin bikin t'evdîrê[102] r̂ayê,*
*3 K'ê dît [dot] şîr bide dayê.*

**S. 16**
*1 Îlahiyo Semede[103],*
*2 Ĉi canikê nazik ĥede,*
*3 K'ê ber bedenê biwelide welede.*

**S. 17**
*1 Îlahiyo te şikir,*
*2 Nava xasê dîwana Şîxadîda bûne dik'ir,*
*3 K'ê dot hemed, dayîkî bûne buk'ir[104].*

---

95 *nevis*
96 *girevan*
97 *qewas*
98 *be'r*
99 *sindûk*
100 *ĥeyîr*
101 e'raf
102 *t'eyîbîr*
103 *semed*
104 *bik'ir*

**S. 18**

*1 Xezîna ĉep û r̂aste,*
*2 Silt'an Êzîd k'ilît–mifte destê xwe bîraste,*
*3 Ilimê[105] Şîxadî peva[106] r̂aste.*

**S. 19**

*1 Lolema, lolema,*
*2 Qesira hûr binyane[107],*
*3 Horî lê r̂awestan[e],*
*4 Ĥuleyî[108] bejna wan[e]*
*5 Şerabe li k'asane,*
*6 K'as dane ser destane,Birêne pêşiya xasane,*
*7Xasê dîwana Şîxadî lê bûne baristane[109],*
*8 Dîwana Şîxadî heqê wan[e].*

*T'emametî Şîxadî!*
*R̂ehme li dê–bavê hostayî!*

## 9. Qewlê cema cimae'ta[110]

**S. 1**

*1 Qewlê cema[111] cimae'ta[112],*
*2 Xelqo, we dikim nesîĥeta[113],*
*3 Werin bibînin ĥuk'umeta[114].*

**S. 2**

*1 Guhdar bin ji guhdêra,*
*2 Dibêjime[115] xwedanê[116] xêra,*
*3 Werin guh bidine qewlê mêra.*

**S. 3**

*1 Dibêjime we dîwanê xasa,*
*2 R̂ê û bera r̂ênasa,*
*3 R̂êbera, r̂êfera,*
*4 E'babet bikin her pênc fera.*

**S. 4**

*1 Her pênc ferê heqîqetê,*

---

105 *ulm*
106 *p'eve*
107 *biniyan*
108 *ĥuleyî*
109
110 [31] (28-32)
111 *Cima'*
112 *Cimleta*
113 *nesilĥet*
114 *ĥukmet*
115 *dibêjme*
116 *xudan*

*2 Şêx û p'îr, hosta û merebî, yarû birê[117] axretê[118],*
*3 Mefer û sinetê,*
*4 Îro dine, [sibê] bandê axretê.*

**S. 5**
*1 Ĥalê me, ĥalê Denûne[119],*
*2 Eva qewla qewlekî qanûne,*
*3 Ĥerĉê kesê vê qewlê [ne] xebîre,*
*4 Bê şêxe, bê p'îre, bê hostê, bê merebîne,*
*5 Ewan p'ar dîwana mîr nine.*

**S. 6**
*1 Zor birin behrê[120] te'rî,*
*2 Mijûl dibûm vî mirarî,*
*3 [Ji] vê dine çûme wê dine, hev cara xweȓa ne bijarî.*

**S. 7**
*1 Lawo[121] te ȓê lêne,*
*2 Koro te haj ȓêne,*
*3 Lawo tu k'oçekî, extîyara[122] ne şikêne[123].*

**S. 8**
*1 Çi lawekî cersojî,*
*2 Ĉirake bi ȓojî,*
*3 Lawo, tu k'oçekî, extîyara ne ĥebojî[124].*

**S. 9**
*1 Çi lawekî bê wesilî[125],*
*2 Ne ji qewlê Xudê, ne ji ĥedîsa ȓesulî.*

**S. 10**
*1 Qebûlo ji ĥasin,*
*2 Mehekê mêra hene k'asin.*

**S. 11**
*1 Mêra û mehekê,*
*2 Vediqetînime ber metrekê,*
*3 Jê der dixin k'êmê xwekê.*

**S. 12**
*1 Hasinî çak şivête,*
*2 Avîtine nava agir û pête,*
*3 Wekî mehek pê nekir şête.*

---

117 *yar û birê*
118 *arxet*
119 *denûn*
120 *be'r*
121 *lao*
122 *extiyar*
123 *neşkêne*
124 *neĥebojî*
125 *bêwesûlî*

**S. 13**
*1 Hew najva avîtine nava yêre,*
*2 Wekî mehek pê nekin k'êre.*
*3 Hew paş va avîtine qenter, ew jî mêre.*

**S. 14**
*1 Gelî mêra dibêĵime we heder-heder,*
*2 Ĥerĉê serhol bire ber,*
*3 Ewî sere xwe ȓêya[126] silt'an[127] Êzîdê sor da birî bû li ser.*

**S. 15**
*1 Sîyar kirim berê qebirê,*
*2 Kire sêrî hevsarê sebirê,*
*3 Bir çû ber dergayê e'mrê.*

**S. 16**
*1 Zîn ji qudret, bor berke,*
*2 T'ac û t'acp'oş,*
*3 E'babet bikin xerqe.*

**S. 17**
*1 Xerqe e'babet kin,*
*2 Ȓastiya lê kin,*
*3 Me'niya der kin.*

**S. 18**
*1 Bihuşta[128] baqî,*
*2 Milk'ê e'babetkirê sedîq,*
*3 Aqil, fe'm, yol û t'erîq,*
*4 Met'ebê me met'ebê dî.*

**S. 19**
*1 Bihuştada xoşî hene,*
*2 Cem e'lamêd wane,*
*3 Ew p'erwendê limoyêd mene.*

**S. 20**
*1 Hûn werin limoyê cinetê,*
*2 Ȓa dibe serêliyayê nav Mişatê,*
*3 Dike gazî xwedanê xêra û xizmetê.*

**S. 21**
*1 Deft'erada hene mişûr[129],*
*2 Bihuştada hene qesir û qisûr,*
*3 Dar di k'eske, berg di nûr,*
*4 Kanî layîq[130], ferş û mermer.*

---

126 *ȓiya*
127 *sult'an*
128 *buhuşt*
129 *Mişûr*
130 *laîq*

**S. 22**
*1 Mişûrada hene deft'er,*
*2 Bihuştada hene qesir û yekser,*
*3 Dar di k'eskin, berg di zêr,*
*4 Kanî layîq, ferş û mermer.*

**S. 23**
*1 Ĥudûr kirin şiva bi def,*
*2 Sinet pê best'eref.*

**S. 24**
*1 Sinet xaş mikane,*
*2 Dumişqa têda[131] girt dîwane,*
*3 Dîwana Şîxadî, melek' Şîxîsin[132] heqe wane.*

## 10. Qewlê Qere Ferk'an[133]

**S. 1**
*1 Sivekê r̂abûm[134] sewda bûm,*
*2 Ĥalek ji min p'eyda bû[135],*
*3 E'wil P'adşayê[136] min xwe bû.*

**S. 2**
*1 Sivekê r̂abûm bê ĥiş bûm,*
*2 K'etime nivînê nexaş bûm,*
*3 Bendê Melek'ê[137] e'rş bûm.*

**S. 3**
*1 Çi siveke xurûre,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexiredîn[138]* ilm[139]*, berat'[140], mişûre[141],*
*3 Go: «Fexiro, bixûne, çendî jore, çendî jêre.»*

**S. 4**
*1 Çi siveke nedire,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexiredîn ilm, berat', deft'ere,*
*3 Go: «Fexiro, bixûne, seranser[e].»*

**S. 5**
*1 Çî siveke sore,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexiredîn xeta more,*

131 *tê da*
132 *Şîxîsin*
133 [31] (32-35)
134 *r̂abûm*
135 *p'eyîda bûm*
136 *P'at'şa*
137 *Melek*
138 *Ferxedîn*
139 *ulm*
140 *berat*
141 *mîşûr*

*3 Go: «Fexiro, bixûne berî jêre, berî jore.»*

**S. 6**
*1 Çî siveke xaşe,*
*2 P'adşayê min daye destê melik Fexiredîn xeta r̂eşe,*
*3 Go: «Fexiro, bixûn binamiya e'rd, e'zman[142], e'rşê.»*

**S. 7**
*1 Çî siveke bi qîmetiye,*
*2 Şêx Fexirê[143] Adîya pirsek P'adşayê xwe kiriye,*
*3 Go: «E'zîzê min, mobeta berî binamiya e'rd û ezman çi bû, çi p'eyda dikir.»*

**S. 8**
*1 Şêx Fexirê Adîya pêş P'adşayê xweva va wediweste,*
*2 P'ê dide p'ê, dest dide deste,*
*3 Go: «E'zîzê min, mobeta berî binamiya e'rd û e'zman çi bû, çi lê dibarest[e]?»*

**S. 9**
*1 Şêx Fexirê Adîya P'adayê xwe deyn[144] dike xeberdane,*
*2 Go: «E'zîzê min, tu hadirî, tu qadirî,*
*3 Te derê qendîlê[145] ber k'ê vedikirî?»*

**S. 10**
*1 P'adşayê min go: «Fexiro weye,*
*2 Xeberê Xwedê – xeberê teye,*
*3 Derê qendîlê ber Şêxûbek'irê feqîr vedikirin.*
*4 Berî mêr–melek'a xerqê[146] qîmetî, Şêxûbek'ir feqîr ber dikirin.»*

**S. 11**
*1 Şêx Fexirê Adîya P'adayê xwe deyn dike xeberdanê,*
*2 Go: «E'zîzê min, te e'rdê çêkirîye bihuşt û doje,*
*3 Go, e'zmana kirîye hîv û r̂oje.»*

**S. 12**
*1 Go: «Fexiro, weye,*
*2 Xeberê Xwedê – xeberê teye,*
*3 Min e'rdê çêkirîye bihuşt, doje,*
*4 E'zmana melik' Fexiredîn[147] kirîye hîv, melik Şemsedîn[148] kirîye r̂oje.»*

## 11. Qewlê Ferxedîn[149]

**S. 1**
*1 R̂ojekê Lalişe,*

---

[142] *e'sman*
[143] *Şêferx*
[144] *deyîn*
[145] *Qendîl*
[146] *Xerqe*
[147] *Melikferxedîn*
[148] *Melikşemsedîn*
[149] (35-44)

*2 E'refatê xuş-xuşe,*
*3 E'zîz meli[150] Fexiredîn ĥalekê[151] xaşe.*

**S. 2**
*1 R̂ojekê Ĥek'arê[152],*
*2 Mêr cema[153] bûne mix̂arê,*
*3 E'zîz meli Fexiredîn hatiye ber ferwarê.*

**S. 3**
*1 R̂ojekê înê,*
*2 Mêr cema bûne xezînê,*
*3 Seb xatirê bavê sitî Xatûnê.*

**S. 4**
*1 R̂ojekê xudûre,*
*2 Pevk'etin cindiyê mîre,*
*3 E'zîz meli Fexiredîn nûr bû xweyî nûre.*

**S. 5**
*1 R̂ojekê r̂ojane,*
*2 Me pirsin xelqê e'limî[154] zane,*
*3 Werin mirinê bidin beyane.*

**S. 6**
*1 Mirin heye heqiye,*
*2 Ser mirinê nedin diye,*
*3 Ber mirinê nedin sergêra,*
*4 Ĥeĉî kesê wê r̂a,*
*5 E'zîz meli Fexiredîn fiĥêl kin boy[155] kinarê Xwedêr̂a[156].*

**S. 7**
*1 Dilê minî xeme,*
*2 E'limno[157] dibêjime we,*
*3 E'zîz meli Fexiredîn çarşemê bûye, çarşemê hilda gedeme.*

**S. 8**
*1 R̂ojekê Şame,*
*2 Dik'ir geîyan çendî ame[158],*
*3 E'zîz meli Fexiredîn ser xurbet[159] t'emame.*
*4 Ser xurbêyî bethal ba biçû heta welî val bû.*

**S. 9**
*1 Şemso, hatiye ser me mecale,*

---
[150] binêr *melik*
[151] *halekê*
[152] binêr *Heq war*
[153] *cima*
[154] *e'alim*
[155] *boyî*
[156] *Xudê*
[157] *e'alemo*
[158] *e'am*
[159] *xurba*

*2 Şems dibêje mêran û mêrsera,*
*3 Ber nek'evin mal-zêr̂ê dine,*
*4 E'zîz meli Fexiredîn vegerîn me t'enêr̂a.*

**S. 10**
*1 Sicad deng dike pê r̂a,*
*2 Ĥeĉa kesê wê r̂a,*
*3 E'zîz meli Fexiredîn vegerînin me t'enê r̂a.*

**S. 11**
*1 Birê nav Sicaye,*
*2 Ĥeznî da maye,*
*3 Biramo, k'afira nemaye bê biraye.*

**S. 12**
*1 Birê nav Nasirdîne,*
*2 Hêsir ĉe'va tê r̂iĥîne:*
*3 Biramo, biratiye çikas şîrîne.*

**S. 13**
*1 Nasiro, birayê min tuyî,*
*2 Car–cara veduxurî,*
*3 Naşî min nebî, şêx Mend vedisuyî.»*

**S. 14**
*1 Birê mine hadirin,*
*2 T'u nedira min negirin,*
*3 Siĥî ezî bimirim, paşî min delaliye şêx Mend ser xwe r̂a bigirin.*

**S. 15**
*1 Birê mine dêm birî,*
*2 Serê birî nayê k'irî,*
*3 E'zabê bavê bidin boy*[160] *kurî.*

**S. 16**
*1 Birê, mine e'sasa*[161]*,*
*2 Bira şêx Mendê Fexira r̂ûnê dîwanê xasa,*
*3 Eşqî yal bira bigêr̂înin dolyan k'asa.»*

**S. 17**
*1 Birano, ĥetanî ezî xaş bûm,*
*2 Fexirê r̂eş bûm,*
*3 Berat' û bexş bûm.*

**S. 18**
*1 Bexş û berat',*
*2 Hindî welat,*
*3 Mirenê zor aşiq dinê kirine xelat.*

**S. 19**

---
[160] *boyî*
[161] *asas*

*1 Birano, em birane amanetê*[162]*,*
*2 We sinet û sinetxan,*
*3 Sinet ȓeze hin ȓezwane.*
*4 Sinet ȓeze t'êre t'ijî,*
*5 Nan û naz–ne'met*[163] *û xêre.*

**S. 20**
*1 Şêx sineta here sexbêre,*
*2 Sinet ȓeze e'nzele,*
*3 T'ijî xoxe, t'ije biye,*
*4 Ber sinetê vegirin gulîya.*

**S. 21**
*1 Gulîya jê vegirin,*
*2 Heq ȓêya*[164] *Şîxadî ve sekirin*[165]*,*
*3 Beha dî*[166] *feqîr û jar pê didebirin.*

**S. 22**
*1 Birano, em birane,*
*2 Ĥeĉî kesê nik ȓewastyane,*
*3 Amanetê we malê xelîfetane.*

**S. 23**
*1 Mala xelîfeta bara wa mîr bin,*
*2 Bermaliyê wan feqîr bin,*
*3 Pêşqedemê wan şêx û p'îr bin.*

**S. 24**
*1 Dibêjime we gelî şêxan û p'îran,*
*2 Bernedin fêniyê mîra,*
*3 Ebadet*[167] *bikin feqîra.*

**S. 25**
*1 Ebadet*[168] *bikin xerqeyê,*
*2 Ew şuxuleke ĉêk pê biye,*
*3 Ew libasê bavê meye.*

**S. 26**
*1 Bavê meyî ew libas ber bû,*
*2 T'acekî nûranî ser[î] bû,*
*3 Wî t'acî ȓa gelekî neder bû.*

**S. 27**
*1 ……………………………… ,*
*2 Gava e'rd û e'zman dixuȓî,*

---
[162] *anemet*
[163] *naznemet*
[164] *ȓiya*
[165] *vesekirin*
[166] *bahadîh*
[167] *e'babet*
[168] *ebabet*

*3 Sitîya[169] beniya xwe dibiȓî.*

**S. 28**
*1 Dibêjime we gelî sitîyano,*
*2 Neĥerifînin k'ofîyan,*
*3 Dest nevêjine zer xirbiyan.*

**S. 29**
*1 Şemsanî ȓabe ji p'îyane.*
*2 Seb xatirê şêx Fexirê Adiyane.*

**S. 30**
*1 Dilê min bêje,*
*2 Dilê minî bêyî dibêye,*
*3 Ȓuĥ k'işand dest û p'êye,*
*4 Ĉe'v ma hîviya kesan weliye.*

**S. 31**
*1 Qasidê ȓuĥê min t'êcire,*
*2 Siĥeta ȓuĥê min dibire,*
*3 Birano, min destûre we xatire.*

**S. 32**
*1 Qasidê ȓuĥê min delale,*
*2 Ȓuĥ k'işand misqal–misqale,*
*3 Ȓuĥ çû, ma qelbekî betale.*

**S. 33**
*1 Qasidê ȓuĥê minî leze,*
*2 Borê minî lezî–beze[170],*
*3 Xilaz nabim eze.*

**S. 34**
*1 Yek ser minȓa sekinî, ĉe'vî mînanî t'ase,*
*2 Neyînûk şivatê dase,*
*3 Pêĉî mînanî misase*
*4 Ĥev xazila wî xelqê cahilî, bêyî sûcî, bê biniyate.*

**S. 35**
*1 Dibêjime we xelqê cahêle[171],*
*2 Ebadet bikin qulba helêle,*
*3 Ebadet bikin qulba nûre,*
*4 Ebadet bikin şûre.*

**S. 36**
*1 Ew şûrêd malêd babane,*
*2 Sereka çendî berane,*
*3 Ew derba şêxan û p'îrane.*

---
[169] *sit'î*
[170] *lezî-leze*
[171] *cahil*

**S. 37**
*1 ………………………………… ,*
*2 Qerqerê min birîn gaz û nîve,*
*3 Biramo çi dinyake bê hîvîye.*

**S. 38**
*1 K'efenê min birîn ĥîjde gaze,*
*2 Danîne ser cinyaze,*
*3 Ser min digirîn welî, biraziye.*

**S. 39**
*1 Biramo, birê mine r̂astî,*
*2 Yê t'irba min bîrastî,*
*3 Yê kevrê selîmê min guhastî.*

**S. 40**
*1 Biramo, birê mine heqîqetê,*
*2 Qalbê min t'irbêda r̂ast kin*
*3 Mala heqiyê nas kin.*

**S. 41**
*1 Biramo, dibêjme we t'aqete,*
*2 Pêşîmamekî bo min dik'ete,*
*3 Giriye sere min vedik'ete.*

**S. 42**
*1 R̂ê girtin, çûne male,*
*2 Biĉûk ĥetanî t'ifale,*
*3 Şemso baqî xaş be înşala[172].*

**S. 43**
*1 Wêda[173] hebûn efendî û qadî,*
*2 Go: «Ji nav me çûne melek' Fexiredînê pisê Adî,*
*3 Hatiye nav me Şerfedînê mahdî[174].»*

**S. 44**
*1 Aşiqa go: «Hîne, ho bi hîne,*
*2 Yê bîna melek' Fexiredîn nav me çûne, em k'îya k'îne?»*

**S. 45**
*1 Eva sindirûke[175] sore,*
*2 Têda[176] Fexirê more,*
*3 Meleka k'işande e'rşê jore.*

**S. 46**
*1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesave,*

---

172 *îşela*
173 *wê da*
174 *Madî*
175 *sindrûk*
176 *tê da*

*3 Şêx Mend maye bê bave.*

**S. 47**
*1 Eva[177] sindirûke zere,*
*2 Eva t'abûe zere,*
*3 Meleka k'işandibû e'rşê sere,*
*4 Ber melkê Ek'bere[178].*

**S. 48**
*1 Eva sindirûke r̂eşe,*
*2 Eva t'abûte r̂eşe,*
*3 Têda Fexirê k'eleşe,*
*4 Meleka k'işandibû e'rşê,*
*5 Ber Melek'ê mirazbexşe.*

**S. 49**
*1 Eva sindirûke sipîye[179],*
*2 Eva t'abûte sipîye,*
*3 Têda Fexirê gulîye,*
*4 Meleka k'işandibû e'rşê êlîye,*
*5 Ber melkê[180] Bêrîye[181].*

**S. 50**
*1 R̂abe bavo, hey r̂abe,*
*2 Çarşem r̂oja ĥesave,*
*3 Şêx Mend maye bê bave.*

## 12. Qewlê zebûn[182]

**S. 1**
*1 Çi zebûnekî[183] meksûre[184],*
*2 Bal e'zîz melî Fexiredîn bihata destûre,*
*3 Minê medih[185] bidana behrê[186] k'ûre.*

**S. 2**
*1 Çi zebûnekî kêm t'aqete,*
*2 Bal e'zîz melî Fexiredîn bihata e'cazete,*
*3 Minê behra emekê[187] bida zor wesfete[188].*

---

[177] *eve*
[178] *yek ber*
[179] *sipi*
[180] *melek*
[181] *bêrî*
[182] (44-48)
[183] *Zebûn*
[184] *mesûr*
[185] *met'ĥ*
[186] *be'r*
[187] *e'miq*
[188] *wesbet*

**S. 3**
*1 Cema bûn zerbave,*
*2 Wê behrê bidin cebabe,*
*3 Têda hene duȓ û cewhere[189].*

**S. 4**
*1 Mediha bidin kitîr[190],*
*2 T'extê te lê emîn,*
*3 Ya Ȓebî, tî Te'alî[191], tî Besîr.*

**S. 5**
*1 Xasa mîr dît, kire nase,*
*2 P'adşaye[192] dure, mobete, k'ase,*
*3 Kire ȓik'nê çendî e'sase[193].*

**S. 6**
*1 Kirin ȓik'in, ȓik'inî,*
*2 Diȓ ji heybeta[194] hincinî,*
*3 Sor bû, sipî bû, sefirî.*

**S. 7**
*1 Sor bû, sipî bû, sefirî, geş bû,*
*2 Ne e'rd bû, ne e'zman bû, ne e'rş bû,*
*3 P'adşayê min k'ê ȓa k'êfxweş bû?*

**S. 8**
*1 P'adşaye min k'ê ȓa herê kir,*
*2 Şaxa mobetê lê kir,*
*3 Ĥesiniya xwe cihê kir.*

**S. 9**
*1 Lê kiriye şaxa mobetê,*
*2 Dest avîte qelema qudretê,*
*3 Hew paş va şêxê ometê.*

**S. 10**
*1 P'adşaye min ĥuk'mê xweyî girane,*
*Danî bû nav wan zor erk'ane[195],*
*Go: «Xerzê[196] nûrî çi nîşane?»*

**S. 11**
*1 Xezcê nûrî bave[197],*
*2 Du cewar hatine nave,*

---

[189] *cewar*
[190] *k'ivîr*
[191] *e'gali*
[192] *P'at'şa*
[193] *asas*
[194] *hêbet*
[195] *mek'an*
[196] *xerc*
[197] binêr *bab*

*3 Yek e'yne*[198]*, yek ĉe've.*

**S. 12**
*1 Yek e'yne, yek beşere,*
*2 P'adşaye min dabû*[199] *dorê xebere,*
*3 P'adşaye min zane k'ê li sere, k'ê li bere.*

**S. 13**
*1 P'adşayê min ĥuk'mê xweyî ȓewa,*
*2 Mexsûs dak'ete*[200] *cewa,*
*3 Sinet mae'leq*[201] *mabû*[202] *hewa.*

**S. 14**
*1 Mae'leq mabû hewa sinete,*
*2 Birine bal*[203] *P'adşaye min hurmete*[204]*,*
*3 E'zîzo! Me te ĥizret û mobete.*

**S. 15**
*1 Mobet danî, qendîl*[205] *avîte nave,*
*2 P'adşaye min pê hilanî bû ĉe've,*
*3 Go: «Min çi got bû duȓê, duȓê weriya bû ave.»*

**S. 16**
*1 Av li duȓê weriya bû,*
*2 Behr pengiya*[206] *bû,*
*3 P'adşaye min merk'ebê*[207] *siwar*[208] *bû,*
*4 Ser geriya P'adşaye min.*

**S. 17**
*1 Merk'ebêyî siware,*
*2 Seyîdî çar k'inare,*
*3 Lalişa nûrîn sekinî heq û ware.*

**S. 18**
*1 Heqû warî sekinî,*
*2 Havênek avîte behrê, behr meyînî,*
*3 Duxanek*[209] *jê duxinî*[210]*,*
*4 P'adşaye min çardeh t'ebeq*[211] *e'rd û e'zman pê nijînî.*

**S. 19**

---

[198] *e'ne*
[199] *da bû*
[200] *da k'ete*
[201] *maliq*
[202] *ma bû*
[203] *bali*
[204] *ĥuriyet*
[205] *Qendîl*
[206] *pingiya*
[207] *mork'eb*
[208] *siyar*
[209] *dûxanek*
[210] *duxûnî*
[211] *tebek*

*1 P’adşaye min R̂eb il-Semede*[212]*,*
*2 Xuliqand çiqa horî, milyak’ete*[213]*,*
*3 Pê çêkir doje*[214]*, cinete.*

**S. 20**
*1 Doje, cinet çê dikirî,*
*2 Dur̂a qendîl nav dikirî.*

**S. 21**
*1 P’adşaye min e’rşa kir sefere,*
*2 Sixir kire ker bi kere,*
*3 Kire r̂ik’ina çendî menbere*[215]*.*

**S. 22**
*1 P’adşaye min e’zman bîraste,*
*2 Mobet qewza r̂aste,*
*3 T’ext çê kir, mek’an guhaste.*

*T’emametî Şîxadî!*
*R̂eme li dê-bavê hostayî!*

## 13. Qewlê e’rd û e’zman[216]

**S. 1**
*1 E’rdê go: «E’zmano, xox, bîh, zeyt'ûne,*
*2 E’zman go, e’rdê go: «E’zmano, giliyê te r̂aste,*
*3 E’rd dibîze ji xirabî dive wê bêne berdest[e] min.»*

**S. 2**
*1 E’zman go: «E’rdo! Tu birê minî li serî,*
*2 Wê wî dikî bêberî teyê ser,*
*3 Min çê kire naz-nemet, tirî,*
*4 Îro şûnda ez tuyê hev r̂a bibine bira.»*

**S. 3**
*1 E’zman got: «E’rdê, bese bike wê gotinê,*
*2 Ser te dibe qetil, buxdan, zinê,*
*3 Ewin miclîsa dinyayê digerin e’cêbê dine.»*

**S. 4**
*1 E’zman gote e’rdê: «Ser min heye r̂oj û hîv,*
*2 Ez çêtirim zêr û zîv.»*

**S. 5**
*1 E’rdê got: «E’zmano, ezim e’rdê dewrêş,*

212 *remil semede*
213 *miliyak’et*
214 *doze*
215 *mehber*
216 (48-49)

*2 Ser min digere cimlet (cime'ta) cêş,*
*3 Qe kesekî k'ubar neçûye pêş!»*

**S. 6**
*1 E'rdê got: «E'zmano, bihare, zeyît'ûne,*
*2 Ser min heye gul, r̂iĥan, beyîbûne.»*

**S. 7**
*1 E'rdê go: «E'zmano, qudreta melka remanî[217] (melkê zemînê),*
*2 Hatiye ser min çar nave giranî,*
*3 Encîle, T'erate, Zebûne, Firqanî.»*

**S. 7**
*1 Encîl k'itaba xaĉp'arêzane,*
*2 T'erat ya cihûdane,*
*3 Zebûn ya êzdiyane,*
*4 Firqan ya e'ceme.*

## 14. Beyt'a heyî malê[218]

**S. 1**
*1 Mala min, r̂o derk'etiye cîda,*
*2 R̂o derk'etiye ji cîda,*
*3 Serê min qurbabe nûra Şemsî Êzdîna,*
*4 Daye çarde t'ebeq[219] e'rd û e'zman.*
*5 Geliyê Lalişê,*
*6 Her çar qulba goveka diniya,*
*7 Nifûsî mefûs encerî t'emam,*
*8 Behrê Qirmisê, pişta gê û masî[220] da,*
*9 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 2**
*1 Mala min, daye behra Qirmisê, pişta gê û masî da,*
*2 Gelî şêxan û p'îran, extîyar[221], k'oĉek û beden miskîna[222],*
*3 Werin derê r̂eşbelekê vekin, belgê becenavê[223] bixûnin.*
*4 Xêra mala Şîxadî bê me'ne mir̂a bêjin,*
*5 De çika ew çi mêrek bû,*
*6 Ciyê xwe çêkir nava ĥeva tiriya da,*
*7 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 3**
*1 Mala min, mala min, mala min,*

[217] binêr *Melikê R̂eĥmanî*
[218] (49-53)
[219] *tebek*
[220] *me'sî*
[221] *extiyar*
[222] *misk'în*
[223] *bacarê, an belcevêzê*

*2 Mala min serê dir̂an*[224] *Elîf*[225] *û Bêne*[226],
*3 Serê lale Elîf û Bêne,*
*4 Extîyarê r̂ûniştine, k'oĉekê wana sekinîne, li p'êne,*
*5 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 4**
*1 Mala min, extîyarê r̂ûniştine, k'oĉekê wana sekinîne, li p'êne,*
*2 Werin şêxekî ji mir̂a bînin,*
*3 Ĥeftê du govek bavê xwe da şêxe, malê şêxa be,*
4 Donzde ilman[227] ilma be,
*5 P'îrekî minr̂a bînin,*
*6 Ĥeftê du govek bavê xwe da p'îr be, malî p'îra be,*
7 Donzde ilman be,
*8 Şêxo dîno, p'îro beden miskîno, Ezîz Xwedaye*[228],
*9 Melek' Şemsedîne, mala me li şêxa jê di nûrîne,*
*10 De werin derê p'erbelekê*[229] vekin,
*11 Belgê becarê bixûnin,*
*12 Xêra mala Şîxadî bê me'ne mir̂a bêjin,*
*13 Çika dînê silt'an Êzîd yek, çima meseb hev cudane,*
*14 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 5**
1 Mala min, mala min, mala min,
*2 R̂o derk'etiye ji dane,*
*3 Serê min qurbabe, nûra Şemsê Êzdîna,*
*4 Daye çarde t'ebeq e'rd û e'zman,*
*5 Her ça[r] qulba goveka diniya,*
*6 Nifûsî zencerî t'emam,*
*7 Behrê Qirmisê, geliyê*[230] *Lalişê,*
*8 Der û dorê wê dane berxê wî şîlanê,*
*9 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

**S. 6**
1 Mala [min, mala min, mala] min.
*2 Daye geliyê Lalişê,*
3 Der-dorê wê dane berxê wî şîlanê,
*4 Gelî şêxan û p'îran,*
*5 Extîyar, k'oĉekê beden miskîna,*
*6 Werin, xêra mala Şîxadî, bê me'ne mi r̂a bêjin,*
*7 Çika ew çi mêreke,*
*8 Diger̂îne qelemê îmanê,*
*9 Ew çi mêreke wezirê dîwanê,*
*10 Ew çi mêreke e'lêkûme*[231] selame,
*11R̂uniştiye geliyê Lalişê ber berê sikane*[232],

---

[224] *duran*
[225] *elîf*
[226] *bê*
[227] *ulm*
[228] *Xuda*
[229] binêr *r̂eşbelek*
[230] *Geliyê*
[231] *e'lêkim*
[232] *sikan*

*12 Heyî malê, heyî malê, heyî malê.*

## 15. Qewlê boreborê[233]

**S. 1**
*1 Sêxê Ĥesen Silt'ane,*
*2 Bavekî[234] qelpê[235] Ȓehmane[236],*
*3 Silt'an Şîxadî ĥemû derda dermane.*

**S. 2**
*1 Sêxê Ĥesen feqîre,*
*2 Bavekî qelpê mîre,*
*3 Silt'an Şîxadî ĥemû derdanî xebîre.*

**S. 3**
*1 Sêxê Ĥesenî mezine,*
*2 Bavekî qelpê momine,*
*3 Mirazê mirazxaza qap'îya Melişîxisine.*

**S. 4**
*1 Sêxê Ĥesenî siĥîde,*
*2 Bavekî[237] qelpê mirîde,*
*3 Mirazê mirazxaza qap'îyê Silt'an[238] Êzîde.*

**S. 5**
*1 Sêxê Ĥesenî esede,*
*2 Bavekî qelpê semede,*
*3 Serbira Şîxadî ne li male[239] sere.*

**S. 6**
*1 Sêxê Ĥesen e'mere,*
*2 Xaliqê[240] minî her bi here,*
*3 Bê ferwara[241] Şîxadî, Melişîxisin ȓuĥ qalbî nayête[242] dere.*

**S. 7**
*1 Sêxê Ĥesenî celale,*
*2 Borê qudretêyî siware[243],*
*3 Silt'an Şîxadî ĥemû derdayî dermane.*

**S. 8**

---

[233] (53-56)
[234] *bavê*
[235] binêr *qelb*
[236] *reman*
[237] *bavêje*
[238] *sult'an*
[239] *nelimale*
[240] *xalq*
[241] *fewrar*
[242] *nayê te*
[243] *syar*

*1 Şêxê Ĥesen diȓ*[244] *cemale,*
*2 Borê qudretêyî siware*
*3 Bê ferwara Şîxadî, Melişîxisin t'u ceseda*[245] *ȓuĥ te nayê bare.*

**S. 9**
*1 Şêxekî min hebû Hekarî*[246] *bû,*
*2 Zerevanê qudretê p'ala wî bû,*
*3 Çarde t'ebeq*[247] *e'rd û e'zman k'efa destê silt'an Şîxadîda bû.*

**S. 10**
*1 Şêxekî min hebû Hekarda,*
*2 Dergewanê qudretê p'al da,*
*3 Çarde t'ebeq e'rd û e'zman k'efa destê Şîxadîda hesar da.*

**S. 11**
*1 Şêxekî min hebû nav e'reba,*
*2 Xwedanê*[248] *qasan*[249] *t'eleba,*
*3 Destê silt'an Şîxadî k'oteke ser herçar meseba.*

**S. 12**
*1 Sêxekî min hebû E'rebistanê,*
*2 Xwedanê dedorê diranê,*
*3 Silt'an Şîxadî xwedanê t'extê qirarê*

**S. 13**
*1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê li me veda,*
*3 Bangîna xwe bigîne melek'ê*[250] *e'rşê semeda,*
*4 Hewara kekê şêx Zeydînê*[251] *bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî ȓeşî nûrînî ber da.*

**S. 14**
*1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane sore,*
*3 Hewara kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî ȓeşî zincî more,*
*4 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriya*[252] *davetin xeberê e'rşî jore.*

**S. 15**
*1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane zere,*
*3 Bangîna xwe bigîne melekê e'rşê sere,*
*4 Bira hewara kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî ȓeşî wê bi nedere,*
*5 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriyê*[253] *davît xeberê e'rşê k'eser.*

---
[244] *dur*
[245] *ceset*
[246] binêr *Heq war*
[247] *tebek*
[248] *xudan*
[249] *qolsan*
[250] *melek*
[251] *Zinîn*
[252] *feriya*
[253] *fêrîr*

**S. 16**
*1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane řeşe,*
*3 Hewara kekê şêx Zeydîn bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî řeşî wê bi k'eleşe,*
*4 Kekê şêx Zeydînê xirabe, fêriyê davîtin xeberê zor nexaşin.*

**S. 17**
*1 Veda, veda,*
*2 Mîro, berê sibê sêvane sipîye,*
*3 Bangîna xwe bigîne melek'ê e'rşê e'liye,*
*4 Hewara[254] kekê şêx Zeydînê bihata feqîrekî t'ac leka, xerqekî řeşî nûrîniye.*

## 16. Beyt'a şêx Mendê Ferxa[255]

**S. 1**
*1 Siveke mexrûme,*
*2 Şêx Mendê Fexira[256] borê xwe kir zîne,*
*3 Ewî çar gêl ĉe'va dibûne.*

**S. 2**
*1 Siveke te'rî baba,*
*2 Şêx Mendê Fexira meşiya bû merzrê ava.*

**S. 3**
*1 Çar gêl dibûn ĥeçar çe'va,*
*2 Gêla kiribû silave,*
*3 Aha şêx Mendo, bêyî ser seriyan, ĥeçar ĉe'va.*

**S. 4**
*1 Gêlê go: «Here lawo, ser sewda[w]o,*
*2 Ser pişta borê xwe řazawo,*
*3 Me ĥeçar gêla k'îjana ĥeyrî[257] dima[w]o!»*

**S. 5**
*1 Şêx Mend digot: «Ezî ne ser sewda[258] me,*
*2 Ser pişta borê xwe řazame,*
*3 Ez bejina bilind, dêmê gulî ĥeyrî mame.*

**S. 6**
*1 Gêla go: «Şêx Mendo, nave min Faye,*
*2 Miĥûba ĥiçkî diniyaye,*
*3 K'iryameta[259] Şîxadî, melî şêx Îsn řizma giran pê va xuyaye.»*

**S. 7**

---

[254] *hevar*
[255] [31] (57-60)
[256] *Ferx*
[257] *ĥeyîr*
[258] *sersewda*
[259] *k'iriyamet*

*1 Gêla yekê go: «Navê min Fate,*
*2 Miĥûba ĥiçkî welate,*
*3 K'iryameta Şîxadî, melî şêx Îsn ȓizmê giran pê va hatim.»*

**S. 8**
*1 Yekê go: «Navê min Gule,*
*2 Miĥûba ĥiçkî dile,*
*3 P'ar tê nebe kesa dil k'afire.»*

**S. 9**
*1 Yekê go: «Navê min Ĥebîbe[260],*
*2 Ĥeça kesê bigire xwetrê dilê xerîbe,*
*3 Ewan bihuşta[261] baqiyêd heye p'ir nesîve.»*

**S. 10**
*1 Gêlê go: «Şêx Mendo, ezê bivime tîre marê[262],*
*2 Ĥeft[263] t'ebeqê[264] axêda herme xare,*
*3 Kesekî min nîne ĉare, xêncî wî Xaliqê Cebare.»*

**S. 11**
*1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê ȓav-nêĉîra t'erk bidime,*
*2 Ĥeft t'ebeqê e'rdê dest-pêĉiyê xwe vedime.»*

**S. 12**
*1 Gêlê go: «Ezê bibime kevotkeke p'eȓ hêşîne,*
*2 Ezê bifiȓime ber p'erê e'rşê e'zmîne,*
*3 Kesekî min ĉar[265] nine, xêncî Melikê[266] Ȓehmîne[267].»*

**S. 13**
*1 Şêx Mend go: «Gêlê, ezê bibime bazîkî[268] ĉeng zirave,*
*2 Ezê bifiȓime ji hindave,*
*3 Ezê herme nava ȓefê Gêlê di navdane.»*

**S. 14**
*1 Gêlê go: «Ezê bivime kevotkeke p'eȓ mirarî,*
*2 Ezê bifiȓime ber e'zmanê fikî t'e'rî,*
*3 Kesekî min nîne ĉarî, xencî wî Xaliqî, wî Cebarî.»*

**S. 15**
*1 Şêx Mend go: «Herê Gêlê, ezê bivime bazîkî ĉeng kuȓim,*
*2 Ezê hindavada bifiȓim,*
*3 Înşala[269] ezê te wan ȓefa dabihirim.»*

---
[260] *Ĥebûbe*
[261] *bihişt*
[262] *mar*
[263] *ĥevt*
[264] *tebek*
[265] *çar*
[266] *Melk*
[267] *Ȓemîn*
[268] *be'z*
[269] *Îşela*

**S. 16**
*1 Gêlê go: «Şêx Mendo, here, go bejina min kela kevire,*
*2 Çar nikalê min sekinîne leşkire,*
*3 P'ar tê t'unebe kesê dil k'afire.»*

**S. 17**
*1 Şêx Mend go: «Herê Gêlê, kela serî jine,*
*2 Ĥeçî gava mala me bîne,*
*3 K'ilît-mifte wê destê mala me vedibin.»*

**S. 18**
*1 Gêlê go: «Herê şêx Mendo, bejina min kela xar da,*
*2 Leşkir sekinîne çarnikal da,*
*3 Kese newêre mêzer bike bal da.»*

**S. 19**
*1 Gêlê go: «Herê lawo, bejina min kela nîvî,*
*2 Serê min hilnayê zêr û zîvî,*
*3 Gele aşiqê mîna te dikine bê hîvî.»*

**S. 20**
*1 Şêx Mend go: «Herê, Gêlê, bejina te kela xar da,*
*2 Çiqa leşker*[270] *bisekinin çarnikal da,*
*3 K'iryameta Şîxadî, melî şêx Îsn ezê bême*[271] *bal da.»*

**S. 21**
*1 Gêlê go: «Şêx Mendo, ezê bibime sêveke sore guliya dara,*
*2 Kese tirsa baẍvançiyê mîra newêre mezer bike dal da.»*

**S. 22**
*1 Şêx Mend go: «Ezê bibime nexweşekî Heq warî*[272]*,*
*2 Ezê řazêm řojekê, dudan, sisiyan, du çaran,*
*3 Xelqê bê: - gel şêx Mendo te çi dermane?*
*4 Ezê bêjim: - sêva sore guliya darane.*
*5 Wê herin biqetînin, dayînin ser dilê şêx Mendê Fexira[ne],*
*6 Wê pê weke her du çe'vane.»*

## 17. Beyt'a şêx Alê Şemsa[273]

**S. 1**
*1 Me yarek digirt me bike minetê,*
*2 Şerqê bixûnim Şamê her vê xetê,*
*3 Ew muĥbeta cidê me tê.*

**S. 2**

[270] *leşkir*
[271] *bê me*
[272] *hekar*
[273] [31] (61-63)

*1 Me yarek digirt şewq*[274] *be,*
*2 Ĥemû p'ê û me'niya be, t'erîq be,*
*3 Ba dilê şêx Alê Şemsa şîrînî şerîf be.*

**S. 3**
*1 Xeta me divene,*
*2 Dîwana Şîxadî vedikene,*
*3 Te'lî–tengiyê şêx Alê Şemsa têda*[275] *hene.*

**S. 4**
*1 Xetê me şîrînin,*
*2 Dîwana Şîxadî datînin,*
*3 Te'lî–tengîyê şêx Alê Şemsa têda divînin,*
*4 Yarû birê axretê*[276] *hidretê r̂ûdnin*[277] *hêsira dibarînin.*

**S. 5**
*1 Xetê me narijin,*
*2 Dîwana Şîxadî datînin,*
*3 Yarû birê axretê r̂ûdinin hêsira dirêjin.*

**S. 6**
*1 Mexso te çovayê,*
*2 Dengê dûr qewîn nayê,*
*3 Hatime dengê dûr xwer̂a*[278] *bivime.*

**S. 7**
*1 Wexta ezî gulbaẍ bûm,*
*2 Mecalê Şamê dihatin wext bûm,*
*3 Ĥeft sala Şamêda*[279] *girtî bûm û girî–gef bûm.*

**S. 8**
*1 Pêvirê*[280] *me hilatin,*
*2 Hatin, hatin, ava bûn,*
*3 Ĉe'vê miskîn şêx Alê Şemsa ĥeyrî*[281] *wan bûn.*

**S. 9**
*1 Pêvirê me hilatine,*
*2 Me nizanbû qasidê Şamêne,*
*3 Boy*[282] *min sêfîlê Xwedê*[283] *têne.*

**S. 10**
*1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da mame,*

---
[274] *şofîq*
[275] *tê da*
[276] *yar û birê axretê*
[277] *r̂ûdinin*
[278] *xwe r̂a*
[279] *Şamêda*
[280] pêwr
[281] *ĥeyîr*
[282] *boyî*
[283] *Xudê*

*3 Min nizanbû[284] ĥebsû Şame[285].*

**S. 11**
*1 Îlahiyo, te em nivîsîn,*
*2 Bin me e’rdekî cî nar[286] sîsî,*
*3 Dibe qurbetiya qewî li me tîsî.*

**S. 12**
*1 Dilo jaro,*
*2 Ne li wan e’rda, ne li van cîya,*
*3 Ẍerîbo ezo.*

**S. 13**
*1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da mame,*
*3 E[z] nizanim k’uva[287] hatime, k’uva herime.*

**S. 14**
*1 Ezê r̂ûniştime,*
*2 Ĥalê xwe da digirîm,*
*3 Bîna bazeke[288] dil birînim.*

**S. 15**
*1 Ta’rîgewrkê[289] li min gewr kir,*
*2 Berê sibê li min ker kir,*
*3 Min ĥef[290] [t]sala li Şamêda[291] sefer kir.*

**S. 16**
*1 Hat e’yda[292] R̂ehmaniyê[293],*
*2 Şêx Alê Şemsa zîndanê hate berdanê[294],*
*3 Hat mizgîna îmanê,*
*4 Ya R̂ebî, şikir, şêx Alê Şemsa hate dîwanê.*

---

284 *nizan bû*
285 *ĥevs û Şame*
286 *cînar*
287 *ku va*
288 *bez*
289 *Terîq e’wrek*
290 *ĥev*
291 *Şamê da*
292 *eyîd*
293 *r̂eman*
294 *ber dan*